

P.T.05



TÊKOŞER



hejmar:24

sal:1984



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

TÊDAYÎ

| | | |
|--|--|-------|
| TIRKÎYE VEGERÎYA KONSEYA EWRUPA | Pervîn | R. 3 |
| PÊŞNEYAREK JI PARLAMENTOYA BELÇÎKA RE | | R. 5 |
| DÎROKA KURD Û KURDISTAN | Derwêş | R. 6 |
| TÊGIHEŞTINA ÇÎROKÊN GEL | Torî | R. 8 |
| KURDISTAN, ÇEND NOT LI SER JÎNA ABORÎ Û ÇANDÎ | Pervîn | R. 12 |
| NAVÊN KURDI | Eziz R. Akreyi, M. Ferzend Baran | R. 16 |
| SAXÎYA BIYANIYAN Û MÊKANÎZMÊN ENTÊGRASYONÊ | Pervîn | R. 18 |
| <u>HELBEST</u> : DIJMIN ÇI BI ME KIR | Ahmed | |
| H Ê V Î | Derwêş | R. 20 |
| XEBATA ME | | R. 21 |
| TÊKOŞER'DEN HABERLER | | R. 22 |
| DÛMAHÎ (DEVAM) | | R. 23 |
| 1 MAYISLAR | Yalçın | R. 24 |

TÊKOŞER: KOVARA TÊKOŞER, YEKÎTÎYA KARKER Û XWENDEKARÊN
KURD LI BELÇÎKA

TÊKOŞER: TÊKOŞER, BELÇÎKA'DAKI KÛRT IŞÇI VE ÖĞRENCILER
BIRLIGI'NIN DERGISI

BERPIRSÎYAR: M. Nezh YALÇIN

NAVNÎŞAN/ADRES: TÊKOŞER
B.P. 33
1730 ZELLIK
BELGIQUE

BUHA/FIAT: 40 F.B., 2 DM, 6 FFR.

ABONETÎ : 160 F.B.

N° BANKA : 426-3144071-85
KREDITBANK
BELGIQUE

TIRKIYE VE GERIYA

KONSEYA EWURUPA

Per vîn

Piştî derba cunta faşîst di tarîxa 12.9.1980 de, merkezên ewrupîyên bilind, weka Konsey û Parlamana Ewropa, li ser rewşa Tirkîyê pîrr caran axaftin, delegasyonan şandin wira, Lê, biryarên xwe zû bi zû li ser wê ne stendin, ji bo ku hukûmeta Tirkîyê faşîst be jî, ev dewlet ji Ewropa û Amerîka re pîrr pêwîst e: ew endamê NATO ye û li hemberî Sovyêtan dîwarekî pîrr girîng e. Ji bo vê yekê, Tirkîye ji bo Amerîka û Ewropa ji Iranê, Yûnanîstanê û welatên dinên Rojhilata Navîn pêwîst û girîngtir e. Van dewletên empêryalîst hebûna perçekî pîrr piçûk ji Tirkîyê li Ewropa û propaganda Ata Turk ku Tirkîye welatekî ewrupî ye dikin behane û Tirkîyê dikin endamê NATO, Konsey Ewropa û cihên dinên hassas û giran. Lê, ev behane ji empêryalîstan re ne bes bû. Pîrsa Kurdîstanê, û bi hêzanî, ya Kurdîstana Tirkîyê, wan ditirsîne. Ji bo ku ew baş zanin ku eger gelê kurd dijî hukûmeta Tirkîyê û sê welatên din rabe û mafên xwe bistîne ewê menfaatên wanên aborî û stratêjîyên pîrr mezin kêmbibin û yan jî bi carek nemînin.

Emê li jêr biryarên ku van merkezên ewrupî li ser Tirkîyê stendine, bi awakî kronolojîk, bînin bîra xwendevanan:

17.9.80 : Parlamana Ewropa: (10 welatên ewrupî endamên wê ne):

- a) grûpên sosyalîst, dêmokratên fille û lîbêral dixwazin ku Tirkîye mafên mirovatî û azadîyê vegêrîne.

- b) grûpên kommunist û hevalên wanên fransîz û îtalyan derba cunta mahkûm dikin û dixwazin ku Bazara Ewropî pêwendîyên xwe bi Tirkîyê re rawestîne, heta hilweşandina cunta. Lê, piranîya endamên Parlamenê vê pêşneyarê davêjin.

- c) Li Bruxelles, Wezîrên Karên Derve yê Ewropî îlan dikin ku Bazara Ewropî ewê hevkarîya xwe bi Tirkîyê re baje.

1.10.80 : Konseya Ewropa "Mecelisê Parlamantêran" (21 welatên ewrupî endamên wî ne) :

Biryarek distîne ku ji Tirkîyê bixwaze ku pîrr zû vegere dêmokrasîyê û ku eger sîstema xwe ne guherîne ewê ji meclisê bê avêtin.

Meclis, di têksta vê biryarê de, van daxwazan pêşneyar dike: pêwîst e ku Tirkîye ji Lihevhatina Ewropî li ser Mafên Mirovatî re hurmet bike, girtîyên siyasî berde û partî û sendîkan serbest bihêle. Di axaftinê de, parlamantêrên kommunist û pêşverû derhal qewirandina Tirkîye dixwazin, lê pêşneyara wan tê avêtin.

NOT: di Konsey Ewropa de du meclis hene: ê

parlamantêran ku hemû endamên wî parlamantêrên welatê xwe yên ewrupî ne, û ê Wezîran ku hemû wezîrên karên derve yên welatên xwe ne. Giranîya meclîsa wezîran ji ya parlamantêran pirtir e. Ango, eger meclîsê parlamantêran endamên Tirkiyê biqewirîne jî, wezîrê derve yê Tirkiyê di meclîsa wezîran de dimîne, heta ku ev meclîs jî biryara xwe li ser wê bistîne.

21.II.80 : Parlamana Ewropa : sê proje tîn pêşneyar kirin, lê her sê jî tîn avêtin.

27.11.80 : Amnesty International : Liqên Belçîka û Fransa, di daxwîyanîkî çapê de êşandinan di girtîgehên Tirkiyê de protesto dikin.

Çile 81 : Konseya Ewropa : Axaftin li ser rappora endamê Awstûrî, Ludwig Steinter, ku ji Tirkiyê vegeftîyaye û ku dixwaze ku Konseyê bi vî dewletê re ne pîrr hişk be.

Gulan 81 : Konseya Ewropa : Tirkiye dawet dike ku vegere dîmokratîyê.

Çile 82 : Bazara Ewropa : Alîkarîya xwe ji bo Tirkiyê ku digihêje 600 milyon dollar radiwestîne. Hukûmetên Danîmarka û Norwêj jî alîkarîyên xwe yên diravî disekinînin.

Îlon 83 : Konseya Ewropa : Biryarek distîne: Parlamana ku ewê li Tirkiyê di tarîxa 6.11.83 de bê helbijartinê gelê tirk bi awakî dîmokratîk temsîl nake. Ango, ev parlamana ewê nikaribe beşdar bibe xebatên meclîsê parlamantêrên Konseya Ewropa.

30.1.84 : Konseya Ewropa : Delegasyonêkî ji 12

endam û 12 wekîlên parlamana Tirkiyê, ku di 6.11.83 de tîn bi-jartin, cihên xwe di parlamana Konseya Ewropa de digrin, bê ku bîrê dawet kirin, û di helbijartinan de dengê xwe didin ! Li ser de jî, Konseya Ewropa grêva nîvçe ku wergeran (tercuman) di 2.2.84 de despê dikin dike behane û axaftinê davêje meha gulanê !

12.4.84 : Parlamana Ewropa :

Grupa Sosyalfîst pêşneyar dike ku welatên ewrupî berdana girtîyên siyasî li Tirkiyê bixwazin. Lê, ev pêşneyar tî avêtin.

9. 5. 84 : Konseya Ewropa

Biryar distîne ku Tirkiye vegere Konseya Ewropa. Berê vî biryarê bi çend rojan, delegasyonê vî Konseyê ji Tirkiyê vedigere û li Parîsê, di civîna xwe ya çapê de, îlan dike ku Tirkiye gavek avêtiye ber bi dîmokratîyê. (Xwedê giravî ku hatina hukûmetêkî sîvîl û vekirina sê partîyan piştî helbijartinên mahallî di 25. 3.84 de, îsbat dikin ku Tirkiye hêdfî hêdfî dibe dîmokratîk). Rappora Amnesty International ya nuh êşandin û daleqandinên tirk û Kurdan îlan dike û îsbat dike ku li Tirkiyê tu dîmokratî tunne ye.

Li Bruxelles, di civîna çapa Komîta Belçîkî ji bo Parastina Mafên Mirovatî li Tirkiyê, di tarîxa 2.5.84 de, parlamantêrê belçîkî Claude de Jardin ku endamê sosyalfîstê delegasyonê Konseya Ewropa bû û ku ketibû girtîgeha Diyarbekrê, mixabin, weka berê hukûmeta Tirkiyê mahkûm ne kir, dîtinên xwe li ber me bi awakî vekirî ne got û ji pirsên rojnamevanan revîya. Guhartina Claude de Jardin Kurd û Tirkên Belçîka pîrr êşand, ji bo ku, ji

Pêşneyarek ji Parlamentoya Belçîka re

Di tarîxa 22 Adar 1984'de Senatorê Belçîkî, J. HUMBLET û çend hevalên wî, ji parlamentoya Belçîka re pêşneyarek dan ji bo stendina biryarekî di derheqa mafên mirovatî û komî li Tirkiye.

Em di binî de teksta vê pêşneyarê, weke xwe datînin.

SENAT DE BELGIQUE

SESSION DE 1983-1984

22 MARS 1984

PROPOSITION DE RESOLUTION

sur le non-respect des droits de l'homme et des collectivités en Turquie

(Déposée par M. Humblet et consorts)

Le Sénat,

Constatant que, selon les meilleures sources,

- les droits essentiels de l'homme et des groupes sont violés de manière courante en Turquie;
- on y compte encore des milliers de prisonniers politiques;
- la torture y est quotidiennement pratiquée dans les prisons, notamment au Kurdistan;
- plusieurs détenus sont morts à la suite de tortures.

Considérant que,

- le Gouvernement turc ne cesse d'affirmer qu'un processus de démocratisation est en cours;
- la Turquie se trouve être alliée à la Belgique au sein de l'O.T.A.N.;
- la Turquie est encore toujours aujourd'hui associée à la Belgique au sein du Conseil de l'Europe,

Invite instamment le Gouvernement et, en particulier, le Ministre des Relations extérieures,

- à faire des représentations au Gouvernement turc sur les sentiments d'horreur que provoquent les pratiques inhumaines;
- à s'employer par son action dans les instances où la Belgique est associée à la Turquie à ce que toutes les pressions politiques, diplomatiques et économiques soient mises en œuvre pour que la Turquie mette fin à ces pratiques.

F. DELMOTTE. J. HUMBLET. D. ANDRE.
J. LEPAFFE. W. SEEUWS. W. LUYTEN.

BELGISCHE SENAAAT

ZITTING 1983-1984

22 MAART 1984

VOORSTEL VAN RESOLUTIE

betreffende het niet in acht nemen van de rechten van de mens en de gemeenschappen in Turkije

(Ingediend door de heer Humblet c.s.)

De Senaat,

Vaststellende dat, volgens welingelichte kringen, in Turkije

- de wezenlijke rechten van de mens en van groepen doorlopend geschonden worden;
- nog duizenden politieke gevangenen zijn;
- in de gevangenissen nog dagelijks gemarteld wordt, met name in Koerdistan;
- verscheidene gedetineerden gestorven zijn als gevolg van martelingen.

Overwegende dat,

- de Turkse regering niet ophoudt te beweren dat er een democratiseringsproces op gang is gebracht;
- Turkije een bondgenoot van België is binnen de N.A.V.O.;
- Turkije nog steeds samen met België in de Raad van Europa zit,

Vraagt met aandrang aan de Regering en inzonderheid aan de Minister van Buitenlandse Betrekkingen,

- de Turkse regering te wijzen op het gevoel van afschuw dat die onmenselijke praktijken opwekken;
- in de instellingen waar België samen met Turkije deel van uitmaakt, alles in het werk te stellen om Turkije onder politieke, diplomatieke en economische druk te zetten ten einde te verkrijgen dat aan die praktijken een eind wordt gemaakt.

DI ROKA KURD Û KURDISTAN

Derwêş M. Ferho

DI ZEMANÊ ŞERRÊN ÎMPERETORIYÊN ROMA Û ÎRANÊ DE

Paş ku keliha Diyarbekrê ket bin destên Îraniyan, hinek eşîrên Kurdan arfkarina leşkerê Roma kirin û dîsa kelih ji wan hate sitandin. Ji wê rojê û paş de şerrên mezin di navbera leşkerê Roma û yê Îranê de çêbûn.

Di zemanê hikimdar I. Hüsrev Nüşûrvan de leşkerê Îranê, dîsa di nav Kurdistan re dibuhure ku welatê Laz'an, Lazikîya jî bixe bin hikmê xwe. Di vê demê de jî Kurdistan ji aliyê vê hêzê talan dibe. Di vegeza xwe de hêrişê dibe ser leşkerê Roma, û Nisêbînê ji bin destên wan derdixe.

Şerrên di navbera imperatorê Roma Heraklus û kralê Sasanîyan de heta hatina Îslamê dom kir.

Hatina Îslamê

Wek tê zanîn Kurd, ji dîne Zerdest bûn. Paş hatina dîne Îsa bi 33 salan Ermenî jî ev dîn qebûl kirin û bûn ji dîne Îsa. Ji Kurdan kêma kesana bahwerîya xwe bi vî dînî anîn. Vê rewşê heta hatina dîne Îslamê dom kir. Yanî Kurdan dev ji dîne xwe (bahwerîya bi Zerdest) ne berdan.

Bi hatina Îslamê û hêrişên Ereban re rewş hêdî hêdî hat guhertin. Herçend e Kurdan di hemberê dîne Îslamê û hêzên Ereban de serî hildan jî di dema Xelîfe Emer de Diyarbekir, Urfa, Mêrdîn, Musul û Ermenîstan ketin bin hikmê hêzên Îslamî de. Liberxwedanên li Malatya û dardora wê heta dema Muawîye dom kir. Cihê din li Kurdistan şerrê xwe di hember leşkerê Ereban de ne dirawestand. Ji salên 639 ta 644 Kurd û Iranîyan hêzên xwe kirin yek û di hemberê Ereban de şerr kirin. Di van salan de (li mintiqên Ehvaz û Fasa) gelek kes ji Kurdan û Iranîyan hatin kuştin.

Di hemberê hêzên Îslamê de serhildanên Kurdan pirr dom kirin. Her çend hêrişên hêzên Îslamê ji Kurdan re giran bûn jî, heta demê dirêj serî ji Ereban re ne tewandin. Lê ev rewş hêdî hêdî hate guhertin û hêzên Îslamê Kurd û welatê Kurdistan (bi darê zorê) xistin bin hikmê xwe. Di sala 734 de Kurd di aliyê hêzên Îslamê de cih digirin û hember berberên Îslamê de şerr dikin. (Nîşe: dema Silêman Bin Hişam hember II. Merwan serî hildide Kurd, aliyê II. Merwan digirin û di hember Silêman Bin Hişam de şerr dikin. "Ji ber ku dayika II. Merwan Kurd bû?").

Di zemanê Abbasfyan de

Eba Muslim Horasanî xelffetiyê ji destê Emewîyan werdigre û di-xe destê Abbasfyan. Di vî zemanî de Ebû Cafer Mansur dibe walfiyê Kurdistan. Lê li Kurdistan dîsa serhildan dom dîkin. Her serhildanek ku dibe jî, jî alfyê hêzên Islamê tîn perçiqandin. Talanên ku dîkin pîrr mezin in.

Di vê demê de Harzemî jî hêrfşan dibin ser Kurdistan. Ji bo Kurdistan ji bin hikmê Ereban dernekeve, hêzên Islamê li vira bi Kurdan re hember Harzemîyan enfiyê! (cephê) çêdîkin û şerr dîkin.

Kurd dixwazin ku hem Erebi jî welatê wan derkevin û hem jî xwe ji hêrfşên derve diparêzin. Ku em çend nîşanan li vira bidin: di sala 774 de, di şerrê di hemberê Harzemîyan de serekê Eşîra Revandîya tê kuştin. Vê eşîrê bi serê xwe şerrê hember Harzemîyan dîkir.

Kurdên Musulê di bin serokatîya Cafer Mîr Hesên de di hemberê Ereban de serî hildidin (840). Ev serhildan paş demekê dişke.

Li Isfahan û çiyayên Iranê de dîsa Kurd dest bi şerr dîkin (846). Herweha di sala 866 û 870 Kurdan arîkarîna serhildanê gelên din di hember Ereban de kirin ku Ereban zeif bikin (ji hêzê bixin). Ji sala 875 ta 878 serhildana di bin serokatîya Mehmed Hezar Merd dom kir. Di sala 894 de jî arîkarîna Hamdanîyan ji bo hikumetê wan (serbixwe) kirin.

Di sala 906 de Mehmet Bin Hîlal bi eşîreta xwe hêrfşî hêzên Ereban kirin û zezarek mezin dan wan. Paş demekê kurt Abdullah Bin Ibrahim tev deh hezar çekdar dest bi şerr kir. Di vê demê de jî Îbrahîmê Deysem (Îbrahîmê Lawê Deysem) hikumeta bi navê "Hezbanîya" ava dike. Paş re Mehmed Revadî hikim dixwe û navê vê hikumetê dike "Revadî". (Di hinek pirtukên dîrokzanên din de "Hezbanîya" Herbanîya û "Revadî" jî Revanî tê nivîsandin). Dewleta Şeddadîya ji sala 951 ta 1164 ê li bakurê Azerbeycanê dom dike.


Dîsa dewleta Hasnavîye-Berziganî di sala 959 de li mintîqa cîbal ava bû û ta sala 1015 dom kir. (Di hinek pirtukên nivîskarên din de Hasnavîye-Bezîrganî, Her-nawî-Bezîrganî tîn nivîsandin).

Di tarîxa 990 de jî dewleta Kurda ya "Benî Îraz" ava bû. Vê dewletê 70 salî dom kir. Weka ku em dibînin Kurdan, her tim û tim li berxwe da ne, serî li hember dijmin hilda ne û şerrê ji bo azadîya xwe kirî ne. Lê ev serhildan, hikumetên Kurdan û dewletên Kurdan giş di demekê kurt yan jî dereng de ji alfyên hêzên Ereban Îslamî û hêzên din yê biyanî dihatin perçiqandin.

Di eynî demê de jî dîroka Kurdan ku arîkarîna dijmin dîkin tişî ye. Kurdan di cihê ku ji bo welatê xwe û gelê xwe şerr bikin diçûn ji bo welat û gelên din şerr dîkirin. Hê jî dîkin û mimkin e wê hê jî bikin. Li ser vê yekê em di jimarên bînan de dîrawestînin. Di jimara werê de emê cih bidne rewşa Kurdan di zemanê Selçûkîyan û Safewîyan de.

Çend navên dîrokzanên ku li ser dîroka Kurdan nivîsîne :

V. Minorskî, Ibn'ul Ezrak, Ew-lîya Çelebî, J.B. Tavernier, Niebuhr, Carzoni, Della Valle, Thevenot, Poulet, Volney Cholet, Fraser, Hayne, Kinner, Rich, Dittel, Averyanof, Bazil Nikitin, Şerefxanê Bedlîsî, Halîf, William Aegleton, M. Emin Zeki, L. Rambout, C.P.B., Pol Bender, Dr. Belc Şirkuh, Sultan Memduh, Sadîk Melek, Feyzullah Bey, Sir Sidney Smith, İhasan Nuri Paşa, I.Şerîf Wanly, M. Emin Bozarslan, Edgar O'Ballance, Melayê Cizîrî, Dr.Nurf Dersîmî, Ehmedê Xanf, Xenefon, Marko Polo,.....



TÊGIHEŞTINA ÇIROKÊN GEL

I

Torî

Em herine ku dera Kurdistan, emê liqayî bi sadan çîrokên gelê xwe bibin. Her yek ji wana ji yan din xweştir, ji yan din hêjatir. Bi şevên bêhejmar gotina wan dom bikî, em ji guhdarîya wana ti carf tîr nabin. Dema me ji aliyê giranbihayîya bêjeyî (edabî) lêkolanîk li ser wan çîrokên xwe kir, emê bi hêsayî têgiheştî bibin ko çîrokên me ji aliyê bêjeyî, ji çîrokên gelên din î hemçaxî ne kêr, hemberî hev an ji gelek sedeman ji wana pêşvetir in. Weke çîroka Ingilîza î Romeo Juliyet ko bûye sedemîk ji pirtukke Şekspîr û çîroka me, Mem û Zîn. Herdu çîrok ji alfa digihêjine hev û ji alfa jî, ji hevdu diveqetin. Herdu çîrok bi evîna du cuwana tîn hunandin û bi dawîneke bidilêşî diqedin. Lewma di vî alfede herdu çîrok digihine hevdu û herdu bi van sedemê xwe dibin efarê romantîzmê. Lê evîna cuwana, bûyera çîrokê î talî ye. Bûyera bingehî î çîrokê bi evîna du cuwana hatine xemilandin. Bi vî rêyî çîrokan didin xwendin. Bûyera çîroka Romeo Juliyet î bingehî, xwîna di nav du bavikande, yan Mem û Zîn, bekoewanî (fitne, fesat) ye. Xwîna di nav du bavikande giringîya xwe li Ewropa berf sad salî wînda kirîye. Li rojhilata navîn ev sedem li ser wînda bûnê ye. Lê bekoewanîya ko di çîroka Mem û Zîn'de hatî darîçav kirin, doh hebû, îroj jî heye û di nav gelande bûye azinê (metot) emperyalîzmê. Hege doh yekîtiya bavika ev bekoewanî xera dikir, kesan ji hev diveqetandin, weke doh îroj jî bekoewanî, yekîtiya gela, refa û kesa xera dikî û wana ji hev diveqetî. Hege em bî leyistika bekoewanîyê, wê siba jî yekîtiya me xera bikî. Ev yek şanî me didî ko çîrokên me bitenê ne yê çaxên xwe, yê her çaxî ne û giranbihayîya çîrokên me ji vî sedemê tê. Ji vî aliyê xwe jî Mem û Zîn, ji Romeo Juliyet diveqetî û pêşvetir e.

Gelê me bitenê ne bi çîroka Mem û Zîn'de ev sedem darîçav kirîye. Em di çîroka Eloyê Şêxanîde jî evîna du cuwana û bekoewanîyê dibînin. Di vî çîrokêde jî em yekî weke Mîr Seyfîdîn û yekî weke Bekoyê Ewan dibînin. Hesen paşa, paşayê Şamê di daxwîyana mîr Seyfîdîn, du xulamê Hesen paşa, Hiseynê Gizîr û Mihoyê Qeysanî di daxwîyana Bekoyê Ewan'de ne. Karê wan jî digel Hesen paşa'de bekoewanî ye. Lê gelek heyf û mixabin, ev çîrokên î hêja, di dengê çîrokbêjê mede, di tîlê tamburê tamburvanê mede mane. Nehatîne nivîsandin û neketîne nav rupelên pirtuka, li pirtukxanê me û gelên dinde cihê xwe yî hêja negirtin e.

Hege îroj milê di bin giranîya pîrsgirêkên civakîde dihêrîvin, di bin çerçerça parsuwê me di bin vî giranîyêde, sebebîk jê yî girîng, ji tînegîştîna çîrokên gelê me diefirî. Dema ko em tînegîştî çîrokên xwe bûn, emê bersivên gelek van pîrsgirêkan bidin. Ji ber ko gelê me di çîrokên xwede ya baş, ya qenc û ya hêja dane me. Bi danê nemana, çewtîyê wan jî bi wanra dane. Li gel ya baş, ya qenc, ya hêja, rabûne, ya nebaş, ya neqenc, ya nehêja dane. Tîştîk ji me teksîr nekîrine. Ji ber ko gelê me qenc zanî ko jîyan bixweser ne ya baş, ya qenc û ya hêja ye. Çewtîyê wana jî di jîyanêde hene. Wan çewtîya şanî me dane. De em nexapîn, ne tarpîlin.

Em wan çewtîyan di çîroka Sîyamend û Xecê'de hêj xweştir, hêj zalaltir dibînin. Di vî çîrokêde, çewtî di kesekî çîrokêde, di Sîyamendê Sîlivî'de civîne. Di vî çîrokêde çewtî bi hevre, di nav hevde ne, Sîyamend li deverekê ya baş, ya qenc, ya hêja ye. Li deverekî din jî çewtîyê wana ye. Sîyamend her tim di serhildanêde ye. Li ber her tîştî dirabî. Pêşî li ber bîdadîya ko ji aliyê zarokan li zarokne din tîn kirin dirabî. Sîyamend vî serhildanê jî dayîka fêr bûye. Serê zarokên xerab

dişikênî, û milê wana ji cih derdixênî. Bi hêza xwe yî dijar wana tênî rayê. Di arîkarîya gundiyê xwe, cîranên xwede ye. Piştî ra li ber bêdadîya ko ap û jinapa wî lê dikin dirabî. Li ber gundî û cîranê xwe dirabî. Gayê apê xwe yî berdêlê, bê dilê apê xwe, bi jinapa xwe didî serjêkirin û goştê wî li gundîya didî belakirin. Ji tîrsa apê xwe derdikevî derî gund. Ne dihêlî kesek bikevî gund û ne kes ji gund derkevf. Duvê kerê gundîya, tarîyê bizinê wan, guhanê çêlekên wan jêdikî. Ji gundê xwe derdikevî. Berê xwe didî rêya zozana. Cilê xortekî fî nû, di rêde jê distênî, û yên xwe yî kevin didiyê. Diçî navê la Emer begê. Xulamê Emer begê fî odê, ji ber ko nanê kevişawitî, pêra hastuwê bêgoşt didiyê, dikujî. Ji ber ko her tim talpîka binê qehwê didiyê, qehwekarê odê dikujî. Xulamê ko cehê haspa didizî, dikujî. Dîsa bi hêza xwe yî dijar, hemuwa tênî rayê.

Ev serhildana hember bêdadîyê û li devarna bêdadîya ko wî kirî, rojekê divergerî serhildan û liberxwedana netewî. Di van rojandê, netebtîk diê la Emer begêde destpêdikî. Xwiyayê ko hewaleke mazin liê lê qewimîye. Ji xeynî dengê axîn û offnê li dora xwe nabînî. Kesê lê neçar in. Emer begê û girgirekê lê ev çend rojin di şêwrê de ne. Lê ti çare nayê dîtin. Dewleteke xwînîmîj tevluê la Emer begê, tevê şîrê Kurda bi bêşeke giran bêşdaye û bazirganê wê dewletê fî ko bêşê didî hev, van roja wê bê, bêşê ji wana bisitênî. Keda wana fî salekê ji wana bisitênî, destê wana vala û di ber wande bihêlî. Sîyamend di vê sedemêde dibî hêza lê û li ber bazirganê dewletê dirabî. Bazirganê dewletê dikujî, kerwanê bezirganîyê didî ber xwe û tênî la Emer begê.

Sîyamend bi vê namînî, divegerî li ber hêrîftina ko dijin di nav malbatanda kirî dirabî. Di heyamekêde bavê Xecê û heft birayê wê, di navê la mîrê Ereba dijîn. Mîrê Ereba, Xecê hêj dipêçekêde dibînî û li Kurê xwe nîşan dikî. Bi mirîna bavê Xecê, navên ko xuha wana bikevî bin darê kurê mîrê Ereba. Dema ko Xecê ket hejde sala, di rabin, ji navê la Ereba bardikin, tén navserê çîyakî bixweser, konê xwe li wir dideynin û xuha xwe

ji zordestîya kurê mîrê Ereba; li wir jî der ji wana neqerîyaye. Hatîye bi heft birayanra ketîye şerekî giran. Sîyamend li gel heft biraya cihê xwe digrî û hêza Ereba dişikênî. Di hêlî ko hew karibin zordestîya xwe li Xecê û li heft birayê Xecê bikin. Lê vêcarê, kurê mîrê Ereba biqencî nêzîkayî didî wan heft biraya. Bi barên qantira ji wanra zêr û zîv dişiyênî. Dihêlî ko ew heft bira xuha xwe ji Sîyamend bisitênin û bidine kurê mîrê Ereba. Sîyamend diçî dergistîya xwe Xecê bi darê kotekê, bi darê zorê jiê la Ereba disitênî û ber bi çiyayê Sîpana Xelatê diravênî. Xecê li ber çiyê heft gakuvf û nehgoneke pazkuvî dibînî. Yek ji wan gakuvfîya, her şêş gakuvfîyê dîni ji nehgonê bi darê kotekê dîr dixî û nehgonê jixwere dibî. Sîyamend dirabî, diçî wî gakuvfîyê dikujî wîna ji nehgonê bêdîlî Xecê diveqetênî. Li serjêkirinê gakuvfî bi herdu lingê xwe yî paşcotik pihîn li depa singa Sîyamend dixî û wîna ji latekê di dawerqênî xwar. Sîyamend di çîqulikî darîk ji yê latede tê daleqandin. Çîqul di piştî wîde ketîye, di singa wîde derketîye. Piştî wîde Xecê jî xwe ji late diavêje û herdu li wir dimirin.

Em vîna xweş zanin ko çaxê me çaxê serhildanê, çaxê liberxwedanê ye. Dîsa em vîna xweş zanin ko gelê me vîna ne nûha, ji çaxê diroka kevînde dîtiye û darîçav kirîye. Bi vê yekê daxwazîya xwe tevlu çewtîyê wê derdaye. Ev heza dijar fî ko herkesî tênî rayê, hêza gelê me ye. Ev serhildan, serhildana gelê me, ev liberxwedan, liberxwedana gelê me ye. Lê tevlu çewtîyê xwe hatîye darîçavkirin. Hege çewtî neyên dîtin, ew hêz, ew liberxwedan û serhildan weke Sîyamend Silivî, wê ber bi nemanêve biçî. Pêwanê em çîroka Sîyamend û Xecê ji alîyê daxwîyandîna çewtîya hêja dibînî. Nexwe gelê vîna jî genc zanî ko pîrsgîrêkên civakî, ne bi tevger û kirîna kesekî, bi yekbûyin û bi bîrubawerîyê ber bi pêkhatîne ve diçîn. Ev yek di çîroka Sîyamend û Xecêde, ji devê kalekî lê fî pîr der tê. " Sîyamend lawo " got pîrê lê, dema ko Sîyamend sebêba netebtî, axîn û offîna di navê lêde pîrsî. "Bavê mino, tu hêj cahilî, nezanî. Hêj qerqesunê mazin nehatine serê te. Lewma ez bêjim jî, tu ji van tîştî ha-

lî nabî. Ev kar, karê êlê ye, ya baş ew e ko tu nizanibî. Tu here li haspê tawlê bide meyzandin".

Pêwanê em dîsa dibêjin çîrokên me, ne bitenê yên çaxê xwe yên çaxê bêne jî ne û bi vê xweruyiyên (özellîk) xwe di nav kilasîkê dinyayêde wê cihekî hêja bigrin. Em vêna jî servedikin. Kes bi çîrokan mazin dibin û digihin. Kesên ko bê çîrok mazin bûyî, weke darê bejî ne. Bêber in.

Bêşik, bi xwendina çend çîrokan, em têgihêştî têxistîyê (fîçerîk) çîrokên xwe nabin. Divê em gelek û ji her heyamê dîrokê çîrokê çîrokan bixwênin. Ji ber ko hin ji çîrokên me, me dibin çaxê dîrokê î kevin, hin jê çaxê navîn, hin jê çaxê nû. Hine din jî, ji navê çîroktîyê derketin e, di texlîtê şerande, çaxê nêzik didine me. Lê çîrokên me dîsa ji hevdu naveqetin. Weke xelekê zîncîrekê bi hevve girêdayî, di tevayîke ramanîde ne û rista wan çaxa î civakî da rîçav dikin. Bi vê yekê jî, gelê me şanî me didî ko, ristê civakî di nav hevde ne û ji hevdu ti carî ji binî naveqetin. Rista civakî çiqas pêşve herî, hinin ji rista civakî î berî xwe diparêzin.

K E S Ê N Ç Î R O K A N :

Kesên çîrokên me, axa, mîr, beg in. Keçê wan, kurê wan, birazî û xwarzîyê wan, xuh û birayê wan in. Carna jî kesin ji gel (Sîyamend, Muso) xulamne wan (Hiseynê Gizîr, Mihoyê Qeysanî) cêrîne wan in. Li cihna bixweser, li cihna bi wana em wana dibînin. Bûyerên çîrokên me, ji wan kesan, li dora yekî dizîvirî. Kesên çîrokan î din, di rêza duyemînde cih digrin. Ew kesê rêza duyemîn, li gora bûyer û ciha derdikevin holê, sîpartîne xwe diqedênin û winda dibin. Ew kes heta talîya çîrokê, bi kesê yekemîn, ko bûyera çîrokê î bîngêhî, li dora wî dizîvirîra naçin. Bi wîna heta deverêkê diçin û cihê xwe didin kesne din. Bi vê yekê, kesê çîrokê î yekemîn, heta talîya çîrokê liqayî gelek kesa dibî. Bi vê awayê jî, di çîrokekêde em ferzenda naskirina gelek kesan dibînin.

Di her çîrokêde yek ji wan kesê çîrokê î yekemîn bixweser derdikevî ber me. Lê di tevayîya kesên çîrokên din î yekemînde ne. Pêwanê, xweruyîya (özellîk) yekî ji wana, daxwîyana rexik ji vê tevayîyê ye. Xweruyîya axakî, be-

gekî, mîrekî, an kesik ji wana, xweruyîk ji axatî, begîti û mîrîti ye. Ev xweruyî dema ko hatin civandin, ev tevayî wê derkevî holê û axatî, begîti û mîrîtiyê wê bi me bidî nas kirin. Giranîya lêkolana me jî, wê darîçavkirina van xweruyîya bî. Bi vê yekê wan kesa û rista wan î civakî hêj zeltir bibînin.

Di çîrokên mede xelk bêdeng e. Axa, beg û mîr dibênin rabin, ew dirabin. Berê wan didin şera. Di şerande weke şera pevdîçin. Yan dikujin, yan jî tene kuştin. Bi kurtayî, her tişt li gora daxwazîya wan kesan çêdibin. Di şerande navê xelkê egîd, fêris û pehlewana in. Divegerin gundê xwe, dîsa bêdeng in. Di tangayîyêde, bitenê dengê axin û offna wana tê. Lê dîsa ji binî nebêdeng in. Xwe bi tevgerna, bi kesne ji xwe dane nasandin. Bi van tevger û kesan em hêza gelê xwe dibînin. Ew jî di yekîti û tevayîkêde bêdengî ye. Vêna jî di çîrokên xwede xweş didin der. Bi sadan kes, li buwarî kesekî bixweser dikevin şer. Bi kuştina axa, beg an mîrê wan, xwe jî şer didin alkî. Ev tevger daxwîyana yekbûyinke bêdeng e.

B Ū Y E R Ê N Ç Î R O K A N :

Her çîrok li bûyereke bîngêhî tê damezran. Ev bûyer bîngêhê çîrokê ye. Bûyerên din, bûyerên talî ne. Bûyerên talî di tevayîkêde bûyera bîngêhî didin. Kesê çîrokê î yekemîn, ji bûyereke dibuhûrî bûyereke din. Dera ko bûyer lê dibuhûrin, di çîrokande gelek xweş û zelal tê nasandin. Weke wênekê li ber çavê me dirawestin. Bi vî awayî, bûyer weke xelekê di zîncîrekêde, di tevayîkêde tene dayin. Bûyer carna bi bûyerê paş, carna bi bûyerên rex xwe tene girêdan. Di talîya çîrokêde, bûyera bîngêhî derdikevî holê. Em bi vê tevayîyê bûyera bîngêhî half dibin. Gelê me bi vê bûyera bîngêhî ya xwe dibêjî.

Gerek bûyera bîngêhî, gerek bûyerên din, ji hev naveqetin. Di herkekêde xwe bi me didin xwendin. Bi barstika me digrin, heta talîyê me xwere dibin. Çîrokên me ji alîyê bûyera gelek dewlemend in. Yek ji yekê xweştir, ji yekê hêjatir. Lewma der ji me naqerin, heta talîya çîrokê me bi xweve hişk girêdidin. Zimanê gelê me ye. Em çîrokan di xweşkayîya zimanê gelde dibînin.

Z I M A N Ê Ç Î R O K A N :

Zimanê çfrokên me, bi tevayî ji xemlê dûr, hêsa û paqij e. Gelê me weke xwe, li gora dilê xwe di çfrokên xwede diaxivî. Gotina xwe di bin ramanne din xef nakin. Di yek derbêde, bêfetlonek gotinên xwe dibêjin. Lewma herkes bihêsayî têgiheştî zimanê çfrokên dibin.

Çend nîşe ji van axaftina:

- Win maqul hingî bitrin, got cêrî. Wan henekê xwe bi meriva dikin. (Ji çfiroka Seyrê).
- Wê tuxmê te ji ser ruwê dinyayê biqelênî, wê mala te li mîratê bigerênî. (Çfiroka Ehmed begê û Xalit begê).
- Heyla şeş top li mala te bikevî. Bixwedê ko Fatim bidine Elo, Elo bê navserê vê malê, wê sad û yek bavî ji min û te çêbikî. (Çfiroka Eloyê Şêxanî).
- Te xwelf li serê xwe û bavê xwe kirê. Bi xwedê min bi çavê xwe dît bavê te çil şivê hinara di laşê Elode qut kirin. (Eloyê Şêxanî).
- Hema li min biqere pepuko, got Fatim.
- Qeda bi teva bikevî ko li welatê xerîb û xurbetê bi kêrî xwe nayên. (Narenciyê)
- Ma felek bavê te ye. Qey xwîna te ketiyê çavê te û rijiyaye pêşîra te. Ez nûha rabime te, ezê nanê te ji ser rûwê dinyayê qut bikim. (Sfîyamend û Xecê).
- Ma ez layiqê devê te yî kotî û genî me, kotfîyo. (Menca Sêlim axa).
- Ji bav û kala namus avêtine bersa, sa serê xwe jê vegerandfîye (ji çfiroka Xezala Kurda).
- Heyla min bavê te di qebra reş û tarîde rayandfî. (Narenciyê)

Digel van gotinên bêxeml, em ji gelê me, di çfrokên xwede, bi tevayî di nasandina kesên çfrokên î yekemînde gotinne bixeml dibînin.

Çend nîşe ji van axaftina:

- Ez xatun Menca mala Elfîyê Sêlim axa me. Ez tirhika li serê şaxa, kevoka xebxebşîn, li ser banê xaniya, fincanê zêrîn di nav tilihê xatun û efendiyade me.



1830, serbazên Kurd li Avroman

- Ez Teyarim yabo. Ez ne dînim. Ez tayrekî li azmana çengzêrfînim. Ezê şûrê kermanî di situwê xwe, çeffiya xwe di nav çavê xwede bînim. Ezê lingê xwe bikim rikêbê, biqulibim ser piştê şahêrewan. Ezê nêçîra xwe bi darêzorkotekê, bi serê rima gurgilî, ji erdê bihildînim. Ez kêleka xwe li kêleka şahê Ecem dixim. Ez deqê xwe li deqê kor Hesen paşa, xelfî Bexda dixim. Ezê xerc û bêşê heft sala bisîtnim. Ezê li kêleka qantira bişîdînim. Ezê ser bavê xwe Zor Elî axayê Tîmarîde bişîyênim. Ehda xwedê li vî canî ketibî, ez hesabê qurîşekê li bavê xwe nabînim. Hege hêj dilê kurê te Teyarê Qetran nebî, ez Teyarim yabo. Ez hogîçî nava berananim, mij û moran li serê çîyayanim. Bere peşkê baranê hêdî hêdî hatîbî. Bere dijminekî bavê min xedar hebî. Bi kaboka, bi çalapka, bi neqeruşka, ezê xwe li bin guhê xaniya biqelizênim. Di şeva nivê şevê pêde, ezê ser dilê dijminê bavê xwe bikevim yabo. (Ji çfiroka Xezala Kurda).

KURDISTAN, ÇEND ABORÎ Û

ŞEXSÎYETA KURDAN DÎ BÊJEYA (EDEBÎYAT)

Min ev nivîsar ji broşura TÊKOŞER, "Kurdistan, quelques notes sur la vie économique et culturelle", ku me di cotmeha 1979 de weşandibû stendîye û ji zimanê fransîzî wergerandiye kurdî. Di her hejmar de emê ji xwendevanan re perçekî kin ji vê broşurê pêşkeş bikin.

PÊŞGOTIN

ZORDESTÎYA ÇANDÎ

Zordestîya ku li ser gelê kurd tê kirin ne bi tenê bi can êşandin û aborî ye. Ev zordestî, bi hêzanî, çandî ye.

Her çar hukûmetên cîran, ji bo ku pêşveçûna Kurdan a civakî û aborî rawestînin, rêzanekî nezanîyê (analfabêtîsm) ya pîrr xurt dajon. Netîca vê rêzanê eve: piraniya Kurdan nezanin. Nişe: li Kurdistanê Tirkîyê, 72% ji Kurdên ku imrê wan ji şeş salî bêtir e xwendin û nivîsandin nizanin. Ev nisbete nezanîyê di nav Tirkan de 41,4% e. Ango, li Kurdistanê Tirkîyê nisbete nezanîyê du carî nisbete ku li Tirkîyê ye. Di sala 1975 de, li Tirkîyê, ji 18 zanîngeh û 157 dibistan (lîse), zanîngehekî bi tenê - a Erzurûmê û liqê Tib li Diyarbêkrê - û 4 instituyên pêdagojîk û teknîkî li Kurdistanê Tirkîyê hebûn.

Tiştên ku me li jor got bi tenê ji bo hînkirina ziman û çanda serdest (tirkî) hatine çêkirin.

Eger em werin hîn bûna zimanê kurdî bi xwe, ew, ji xeynî li Sovyetan û li çend mintiqên Kurdistanê Iraqê, qedexe ye. Weşandina rojname û pirtûkên kurdî ji qedexe ye. Amanca vê yekê ewe ku Kurd şexsîyet û çanda xwe ji bir bikin.

Rêzana assîmilasyonê ya xurttirin li Tirkîyê ye. Ji hukûmeta tirk re ne bes bû ku hîn kirina zimanê kurdî qedexe bike. Ew ji vê yekê pîrr dûrtir çû: ev hukûmet çanda kurdî kir malê xwe. Her roj, em stranên geleriyên, xwedê giravî, tirkî, lê yên ku mûsiqîya wan kurdî ye, dibihîsin! Komên folklorê ku li Tirkîyê, û li Ewropa govendên kurdîyên ser bi xwe weka govendên tirkî pêşkeş dikin! Cillên ku senetkar li xwe dikin ji weka cillên tirkî tîn nîşandan.

Ev tişt şaş nake, ji bo ku li Tirkîyê Kurd bi awakî resmî tunne ne. Hukûmet navê wan kiriye "Tirkên çiyayî" yan "Tirkên rojhilat"! Mixabî, gelek pêşverûyên tirk di bin tesîra vê rêzanê mane û tevlihevîya ku di nav seneta kurdî û tirkî çêdibe wan naxeyîdîne! Di eksê vava de, ew "şaşiyên" hukûmetê bi xwe dikin.

DITINEN ÇEWT LI SER KURDAN

Çend nivîskarên ewrupî ku "klasîk" bûne Kurdan weka gelekî yan hovî (wahşî) û xwînmêj û yan jî pîrr romantîk wesf dikin.

Di sala 1759 de, Diderot yê fran-

NOT LI SER JÎNA

ÇANDÎ (I)

Pervîn

ZARGOTÎN (FOLKLOR) Û

KURDÎ DE

siz di Encyclopédie ya xwe, cild VII, beş XIII, de Kurdan weka "gelên hovî" wesf dike. Karl May ê alman (1842-1912) ku tu car ne çûbû Kurdistanê, di romana xwe "Durch Wilde Kurdistan" (Di nav Kurdistanana hovî) Kurdan weka gelekî esîl, ser bilind, comerd, şerxwaz, xwînmêj û barbar... wesf dike. Di çend ferhengan de, weka Larousse û Quillet, Kurd gelekî "şerxwaz û talanxwaz" e û hejmara Kurdan ji berî sed salan heta nuha naguhere, ango sê milyon e !

Van efsanan, eger pesna Kurdan bikin û eger jî li wan bi çavekî ne baş binêrin, nişan didin kû merivên ku wan nivîsîne ji Kurdan wênekî "îmaj" sar û teng stendine. Li ser de jî, têkoşîna gelê Kurd a xwîni vê wêne mezintir dike

Eger em li dîtinên ku berpirsiyarên hukûmetên ku Kurdan dipelîxînin di nav xelkê de belav dikin binêrin, emê bibînin ku van dîtinan ji yê ewrupîyan pîr bi tehlîketir in. Ji bo ku van merivan, ne ku bi tenê şexsiyeta kurdî qebûl nakin, lê, heta hebûna Kurdan bi xwe jî înkâr dikin ! Nişe : li Sûriyê, Muhammed Taleb Hilal, serokê polîsê siyasîyê Cezîrê (birek ji Kurdistan Sûriyê), di sala 1963 de, lêkolînek li ser vê mintiqê çêkir. Têde wî dixwest ku "bi awakî zanistî û antropolojîk îsbat" bike ku Kurd "ne netewek in". Di dawiyê de dibêje : "Gelê Kurd ev e : gelekî ku ne dîroka wî, ne medeniyeta wî, ne zimanê wî û ne

eslê wî yê etnik heye. Ew bi tenê xwediyê xurtbûn û qudreta xerabkirinê ye, van sîfetên ku li ba hemû xelkên çiyayî hene".

Hukûmeta Iranê jî dibêje ku zimanê kurdî ne zimanekî ser bi xwe ye, ew zaravekî farsî ye !

ZARGOTINA (FOLKLORA) KURDÎ

O. Vilchevsky dibêje ku folklorê kurdî pîr fireh e û ku sedemê vê firehbûnê ewe ku gelê Kurd parastina şexsiyeta xwe pêwîst dibîne.

Gérard Chaliand, di pirtûka xwe "Poésie Populaire des Turcs et des Kurdes", rûpel 71, de dibêje : "... Helbesta geleriya kurdî dengêkî wê yê ser bi xwe - ango ê ku tu kes pê ne bihistiye - heye û îsbat dike ku ferqên pîr mezin di nav bera gelên rojhilata navîn û gelê Kurd hene".

Çanda gelê Kurd û şexsiyeta wî di stranên geleri, çîrok, pêşgotî (metelok), cêjn (nişe : Newroz) û urf û adetên wî de xwuya dibin :

Stranên geleri :

Stranên kurdî yê evîne, destan û sûfiyete ne. Ew ji stran bê-tir, "helbestên ku tên stiran" in. Ji wan re "lawij" dibêjin. Van lawijan manzaranê nêçîrê, meydanên şer û tabiyete wesf dikin, yan jî ew gotinên evîne ne. Evên dawî (ên evîne) bi piranî ji aliyê jinan tên gotin. Ji nav ên bi nav û dengtirin evin :

Las û xezal, Nazir û Mahmal,
Evinên Zelîxa û Fetûl...

Paganîsm (Baweriyên Kevn) :

Paganîsma Kurdî pîrr caran di
stran, govend û çîrokên kurdî de
cih digre.

Helbestekî pîrr kevn ku bi zima-
nê kurdî hatîye nivisandin wah-
şiyetên ku Ereben misilman anîn
serê Kurdan, gava ku Kurdistanê
îşgal kirin, wesf dike :

Hûrmuzan raman, atîran kujan
Wişan şard we gewre gewrekan

Zorkerê Areb kirdine xapur
Ginay palê heta Şarezor

Şin û kenikan we dil beşina
Merdê aza teli ji roy hewina

Rewîştê Zerdeşt mawe bêkes
Bezika nika Hurmuz ve hiç kes

Bi kurmancî mana vê helbestê ev e:

Hurmuz mir, agir vemirîn
Ûn mezintirîn xwe veşartin

Erebên zordar her tişt xera
kirin

Ew gihastin heta Şarezor

Wan jinan û keçan esfir kir
Bi xwîne zilamên azad nîşan
kir

Zerdeşt bi tenê ma
Hurmuz alî tu kes ne kir

Cosmologie (ilmê zagonên "qanûn" fîzîkê yê dinyayê)

Gérard Chaliand, cardin di pêş-
gotina pirtûka xwe ya ku me li
jor nîşan da, ewha dibêje: "Cos-
mogonîya kurdî ku kanîyekî il-
hamê ya mezin e ji bo helbestan
pîrr dewlemend e: ji bo ku dijî
bê aviyê (mehtesf) xwe biparê-
zin, jin derin kanîyê û avê da-
vêjin hevdu. Carna jî, xwe girê-
didin gîsinê û wê dikşînin nav
çem û çem cot dikin ku jê av bi-
xwazin".

Jina Kurd

Gelek ewrupî bala xwe dan rolê
giring ku jin di civaka kurdî
de dilîze. Basile Nikitine, Ely
Soane û Gérard Chaliand pîrr
caran li ser wê dipeyivin. Di
pêşgotina pirtûka xwe ya ku navê
wê buhurî de, G. Chaliand li ber
jina kurd heyran dimîne: "... Li
gora me, "originalité"ya kûr, û
li gora zanîna me, ya bi tenê,
di ev helbesta gelerîya kurdî
de, bi hêzanî gava ku em dibînin

ku Kurdistan di zemana çanda is-
lamî de ye, ew e ku pîranîya
helbestan ji aliyê jinan tîn go-
tin û cihekî pîrr giring digrin:
eger misilman be jî, ew ruyê xwe
venaşêre, li malê ne girtîye û
eger mêrê wê ne li mal be jî,
ew kare mêvanekî biyanî têxe
hundur. Di eksê govendên gelerî-
yên Ewropa Rojhilat û ên Asya
Rojava ku têde jin cihê ne, di
govendên gelerîyên kurdî de jin
û mêr tevî hevîn. Ev azadî ye ku
dihêle ku jin li ser evîne bipe-
yive û evîne bixwaze".

BÊJEYA (EDEBÎYAT) KURDÎ

Bêjeya kurdî pîrr fireh e û her
gav bi dewlemendîya xwe ketîye
nav dewlemendîya çandî û felsefî
ya welatên ku ew bindest kirine.

Nivîskarên kurd ên bi nav û deng
evîn:

I- Jî Despêkê Heta Sedsala 19'A

- Dawîya sedsala 8'a, paş mîladê:

Raberaxî Hamzanî, bi kurdî, şe-
rên gelê xwe dijî îşgala Ereban
wesf dike.

- Sedsala 10'a:

Ev sedsal bi navê Baba Tahirê
Hamadanî hatîye nas kirin. Ba-
ba Tahir helbestvan û sûffî bû.

Elî Termûkî jî helbestvan bû û
rêzimana yekemîna kurdî û çî-
roka gerrekî (seyahet) di nav
Kurdistanê de nivîsiye.

- Sedsala 11'a:

Elî Herîrî yê Şemînan (1009 -
1079) helbestvanekî mezin bû.

- Sedsala 14'a:

Feqîyê Teyran (1302-1375), di
bin navê "Mîn-Mihê" de, gelek
helbestên evîndarî û felsefî
nivîsiye. Helbestên wî bi ben-
dên 3 beyt bûn. Ew jî helbest-
vanên yekemîn e ku dijî bin-
destîya gelê kurd peyivîye.

- Sedsala 15'a:

Melleyê Cizîrî (Şêx Ahmed), ji
Cizîra Botan (1407-1481), hel-
bestvanekî sûffî bû. Diwana wî
ku ji 2000 beyt ava bûbû bi
nav û deng e. Tesîra wî li ser
ekolekî helbestvanan bi xwe
pîrr mezin bû.

Melle Ehmedê Batê, ji Hekkarî (1417-1495), bi hêzanî bi "Mewlud" (zabûna pêxember Muhammed) ê xwe bi nav û deng bû.

- Sedsala 16'a:

Di vê sedsalê de bêjeya kurdî ya netewî pîrr dewlemend bû.

Idrîsê Bitlîsî, ji Erzurûmê. Merivekî pîrr xwenda bû. Dîrokvanê saraya Osmanî bû. Ew e ku, piştî şerrê Çildêranê, di sala 1514 de, Kurdan dixapîne û ikna dike ku alfiyê Sultan Huseyn bigrin.

Sultan Huseyn, mirê Badînan, di sala 1576 de dimre. Ew xwe-dîyê pirtûkxanekî delal bû, ku têde ji 2000 destnivîsar bêtir hebû.

Şerefeddîn Xan, mirê Bitlîsê. Ew bi Şerefnama xwe (1596) pîrr bi nav û deng e. Li gora Minorsky, Şerefnama "bingeha nasînê me li ser dîroka kurdî ye".

- Sedsala 17'a:

Ehmedê Xanî, ji Hekkarî (1650-1706). Destana gelerîya Memê Alan bi beytan nivîsîye, jêre muhtewakî dînî daye û navê wê kiriye Mem û Zîn. Di destanê de evîna Mem û Zîn di 5000 beyt de dibêje. Ev destan esera mezintirîna klassîkî û netewîya Kurdan e. Têde, Xanî rewşa gelê kurd û bindestîya wî baş dide ber çavan û bangî Kurdan, ji bo yekîtiyê û azadîyê, dike. Ji xeynî Mem û Zîn, Xanî, bi beytan, restnivîsarekî kurdî-erebî û pirtûkekî cografî nivîsîye.

Ismailê Beyazîdî. Xwendekarê Ehmedê Xanî bû (1654-1709). Ji me ra xezalan û ferhengekî kurmançî-erebî-farîsî hiştîye.

Di alfiyê dinê Kurdistanê de jî, di saraya walîyên Erdelanê de, gelek helbestvan hebûn.

- Sedsala 18'a:

Ev sedsala paşveçûnê bû.

- Sedsala 19'a:

Nalî Efendî (1797-1855). Navê wî yê rast Melle Hezîr e. Ew zaravên kurdîyên cihê hîn bûbû û rêzimanekî erebî wergerandî-bû kurdî.

Di vê sedsalê de, hemû helbest-

van tecrube dikin ku dev ji awayên (şiklên) bêjeyîyên kevn berdî û vedigerin ber bi destana gelerî. Helbest ji têkoşîna gelê kurd ku dixwaze ji serdestîya osmanî xwe rizgar bike ilham distîne.

Hacî Qadir Xoy (1817-1894). Ew li Istambûlê dijî. Dîwana wî qîrîneke dijî melle û şêxan. Ew wan ittîham dike ku dijî rizgarîya dîtinê (fîkrê) radi-bin. Ev eser jî 800 rûpel avaye. Helbestên wîyên welatparêzîyê heta nuha bi hemû xurtbûna xwe dijî.

Jinên helbestvan:

Bi pîranî, ew stranên evîne û şerrê distirên:

Mah Şeref Xanim, ji Erdelan (1800-1847)

Sîrê Xanim, ji Diyarbekrê (1814-1865)

Heyran Xanim, ji Naxşivan.

Ayşa Tîmorîya, (di 1902 de dimre).

Mibrehan, keça Melle Husnî Berwarî (1858-1905).

Pîrozî, keça Huseyn Kenûş (di 1911 de dimre).

Xato Xûrşîd, keça Şêx Maruf Kewlos (1881-1931).



1830, zilamek ji eşîra Jof

NAVÊN KURDÎ

Eziz R. Akreyi

M. Ferzend Baran

JI BER ÇI NAVÊN KURDÎ ?

Cihana qedim, çareka dawî ya sedsala bistan (20) diji iroj. Pêşkewtiyên civaki, çandi, tekniki û wd li ber çavan e. Edî meriv bi hêsani dikare biçe hîvê. Bi alikariya radio, televizyon, telefon, rojname, kovar û tiştên din, bihistina bûyeren rojê gelek hêsan bûye... Bi kurtî, cihan bi lez pengav pengav pêşte diçe.

Lê Kurdistan ? Welatê me ?

Gelo, meriv dikare bi hêsani pêşkewtina cihanê, li Kurdistanê ji bibine ? Na. Ciyê ku meriv pêşkewtinê bibine, kuştin, lêdan, zehmeti, paştamayi, jihevketini, zordari û zulum dibine. Li seranserê Kurdistanê bese em evana dibinin.

Bê guman evana ne qederê me Kurdan e. Ne qederê gelê Kurd e. Divê em baş bibinin û bizanibin, ku heke ev tiştana li seranserê Kurdistan heye, pêywist e hinek sedemên vi ji hebin.

Baş e, gelo ev sedem kîjan in ? Sedemê bîngehi ew dewlet in, ku Kurdistan di nav xwe da dabeş kirine. Van dewletan (Turkiye, Iran, Iraq u Suriye) zordariyekî gelek mezin daxistine li seranserê Kurdistan û Kurdistan kirine mêtîngehek (Qolonyek) neçar. Sedemê esasi ya paştamayina Kurdistanê, zordesti û politika hov ya van dewletan e.

Ev dewlet û politikayên wani hov, Kurdistan hewqas paşte hiştîye, ku bi Kurdî xwendin û nivisandin ji êdî bûye gelek dijwar. Ji ber, ku politika dewletên serdest, bi hemû tiştên din ve, Kurdî ji qedexa kiriye.

Yek ji politikayên dewletên serdest ji asimile kirina (helandinê, wînda kirine) gelê Kurd e.

Ji ber vi, dewletên serdest her tişt kirine û dikin. Xwendin û nivisandina Kurdî qedexa kirine. Zordariyek mezin danine ser çanda Kurdî. Strand, leystik û afirandinên Kurdî kirine yê xwe, xwestine dirûka Kurdî bila bête birkin. Û bo pêstexistina evana hemû rê an girtine an ji qedexa kirine. (x)

Her waha navên Kurdî ji bûye qedexa (Nemaze li Kurdîstana Tirkiyê). Wisa li serî hatiye, ku ciyê navên Kurdî, divê Kurd, navên Turki, Erebi û Farsi bikarbinin û van navan li mindalên (zarokên) xwe din. Heke bi zor û lêdan ne be, tu cari giring, nine ka mirov kîjan navî bikartine. Lê dema bi zor û lêdan be, divê mirov li ser bifikire. Qedexa kirina navên Kurdî perçeki ye, ji politika zordar û serdest.

Lê divê em birvenekin, ku çawa qedexa kirina navên Kurdî perçeyek ji politika zordaran e, her waha bikaranin û pêstexistina navên Kurdî ji perçeyek ji têkoşina netewî û demokrat e.

Ger em dixwazin şoreşa gele Kurdî ya netewî û dimokrat pêstebikeve, bîghîşe serfirazi, divê em vahnîyê xwe yê bikaranin û pêsta xistina navên Kurdî ji, birnekin.

Ev xebata, destpêkeki ye bo pêstexistina navên Kurdî. Bê guman em nikarin bêjin, ev xebata destê we, bi her awayî rêkûpêk e. Kemanîyên wê pir in. Lê bo pêkaniya wê gelek kitêb, ferheng, çirok, serpêhati û wd hatine xwendin û lêkolîn.

Daxwaziya me ew e, ku xwendakar bikaribe bi alikariya wê, navên Kurdî hin zêde û firehtir bike.

Di meha neh'ê (9) 1980, fersendê min û Eziz R. Ekreyî hû, ku em hevdu bibinin. Di peyvandinên

me yê n çend rojan da xuya bû ku am her du ji li ser berhev kirina navên Kurdi ji mijûl dibin. Û me biryar da ku em xebatên xwe bikin yek. Bi vi awayi min ew navên ku Eziz R.Ekreyi berhev kiribûn girtin û dû re hemû navan civand ser hev. Piraniya navan ji hêla kak Eziz R.Ekreyi hatibû berhev kirin.

Dû re ji, min dûzan da navan wan serrast kir û ji çapê ra amade kir.

Em hêvidar in, dê alikariya wê dibe.

(x)Sêweyê (babetê) politika Turkiyê ji yê n dina piçek cida ye. Ango hin xwinxwar û hoy e.

22-11-1980

Stockholm

M. FERZEND BARAN.

A - KEÇ

Avenos, Avêsta, Aying, Avok, Avşirin, Avxawin, Awazxweş, Awên, Ayin, Armiş, Armoş, Asayiş, Asmin, Asya, Aşti, Avbarik, Avdêr, Axirawaz, Agircan, Agirperi, Ahing, Ajel, Ala, Alin, Amanc, Arayiş, Avêr, Avjin, Avnoş, Avreng, Avtav, Awaz, Avbar, Axeban, Argon, Armişok, As, Asik, Asmihan, Aşava, Aştixwaz, Avdar, Avegird, Agirbaran, Agirk, Agirvin, Aho, Akrê, Ali, Alok, Amojgar, Arezo.

A - KUR

Abdin, Adkan, Agadar, Agir, Agirbaz, Agirdad, Agirdost, Agirmezd, Agirnoş, Agirtuxm, Agirxweş, Agirxoş, Agirdax, Agrok, Akoyan, Alo, Aram, Ararat, Ari, Arin, Armin, Arşeng, Aryan, Asan, Asingir, Asos, Aşna, Ava, Avedan, Awat, Aza, Azer, Azrok, Adem, Aferin, Agah, Agirbawir, Agirbût, Agirdar, Agirmeh, Agirmêhr, Agirpij, Agirxor, Agri, Agrin, Ako, Alan, Amêd, Arança, Ariş, Ari-

mêhr, Arko, Arpak, Arya, Aryo, Asin, Asman, Aşevan, Aştiti, Avdel, Avrûdar, Axti, Azad, Azrên, Agirbêcan.

B - KEÇ

Baran, Barik, Başê, Batov, Bakurman, Baldar, Balor, Banê, Bace lan, Bade, Baedrê, Bagêr, Bêndan, Bênfêza, Bênxoşk, Bêri, Bêsvikê, Bêxal, Bêzo, Bijûn, Bilexş, Bilûr, Binêr, Binevan, Birozirav, Bisk, Bitwin, Belgzêrin, Beng, Bengzêrin, Bercok, Berdil, Berhem, Bersin, Berxik, Barega, Basitkê, Batas, Bawêşin, Bala, Balind, Balpan, Banû, Badem, Badoş, Bağêr, Bahiv, Bênav, Bêndar, Bênxweş, Bêrm, Bêrivan, Bêwijan, Bêzar, Bijkuj, Bilbas, Bilêsê, Binav, Binefş, Birifkan, Bisir, Bitin, Biber, Bendê, Bengin, Berben, Berdil, Berfê, Bermali, Berx, Bes, Besêxan, Besina, Betti, Bexşin, Beyan, Beydax, Bêbo, Bax, Bazbend, Bazin, Bazyan, Bedexşan, Befirav, Befrê, Befrin, Begixan, Begsixan, Behê, Behya, Belek, Belereş, Belg, Buhar, Bûkmar, Boran, Bor, Borexan, Biyare, Bogag, Besê, Besna, Bexşan, Bextspi, Beybûn, Bêbad, Bênav, Baxçe, Bazê, Bazinzêrin, Bedew, Bedlis, Befirbar, Befri, Begi, Begok, Beh, Behre, Belalûk, Belepôş, Beletivk, Belgin, Buxav, Bûstan, Borin, Bozê, Bibi, Biyok.

B - KUR

Baban, Babegur, Babik, Babo, Bacevan, Badin, Bado, Bahur, Bakori, Balyoz, Bangêr, Barani, Barzan, Basere, Bapir, Bawir, Bavo, Baxvan, Bazirgan, Bazo, Bedo, Behzad, Beheşti, Behmend, Behroz, Belengaz, Bender, Bendo, Berbad, Berbayar, Berces, Bergir, Beroj, Bertal, Bengin, Berxo, Berevan, Bexşinde, Babecan, Babeke, Bablo, Babzade, Bacilor, Badinan, Bahoz, Bakirov, Balkok, Bandir, Bapir, Baro, Barove, Batman, Bawec, Bawil, Bayezid, Bazi, Bedirxan, Befro, Behdar, Behmen, Behro, Behzad, Bemo, Bendewar, Beran, Berbar, Berbizin, Berdiva, Berin,

dûmanî rûpel 23

SAXÎYA BIYANÎYAN

ENTÊGRASYONÊ

Min ev nivîsar ji bo komelekî ku bi pirsên saxîya biyanîyan mijûr dibe nivîsiye. Ez li vira wê ji zimanê fransîzî werdigerînim kurdî.

Her meriv, gava ku civaka ku têde dijî bi carek biguherîne, pêwîste ku ew di civaka xweya nuh de cih bigre (entêgrasyon). Eger ev civaka nuh dijî wî derkeve û eger xurtbûna meriv tunnebe ku gava yekim bavêje ji bo ku pêwendîya xwe bi vê civakê re bike, tenêyîya wî û mezînbûna pirsên rojêyên jîna wî ya nuh wî bi awakî kûr dilşikestî dihêlin û carna jî tewazuna canê wî, yan psikolojîya wî û yan jî zihna wî qels dikin.

Pirr caran, dêlva ku dijî vê derbê rabe ser xwe, ev meriv xwe li ser xwe dipêçe, di nav hevalên xwe yên ku ji cinsiyeta wî ne (ghetto) û yan di nexweşiyê de xwe diparêze.

Maniyên ku dijî entêgrasyonê derdikevin pirr in:

a) Maniyên derva:

Her civak bawer dibe ku prensîpên wê ji ên hemû civakan bilindtirin. Loma, ew dijî her guhartin, bi hemû hêzên xwe, derdikeve û ji her biyanî re modêlê dîtî (fîkr), jîn û çanda xwe ferz dike.

Eger ev biyanî xezînekî wî ya zihnî (entellektuel) ya giran hebe û eger ew ji civakekî dewlemend derketibe, ev civaka nuh jêre hinek hûmet dike. Lê, gel vê qasê, ev civak tevgera wî û peyvên wî kontrol dike ji bo ku emîn bibe ku ev meriv li gora prensîpên wê diçe. Lê, eger ev civaka nuh ev biyanî ne ecibîne, ji bo ku ne nazîk e û usûlan nîzane, ew wî nasnake û jêre heqaret dike.

b) Maniyên hundurî:

Di mîkanîzmên entêgrasyonê de, rûlê civaka sosyal û entellektuel ku biyanî jê derketiye pirr girîng e. Meriv çiqas ne xwenda û ne dewlemend be, ew qas jêre girtina cihekî di civakekî nuh de zor dibe. Ghuartina gîstîya organîzasyonê civakî û awayê

jînê û dijminayîya civaka nuh, vî merivî mecbûr dikin ku di quncika xwe de bimîne û bi urf û adetên xwe ku carna kevn bûne bigre û qîmeta wan bilind bike.

c) Tunnebûna rêzanekî (siyasetekî) rast ji aliyê hukûmeta Belçîka, ji bo cih kirina biyanîyan.

Gava ku Belçîka lihevhatinan bi hukûmetên welatên karkerên biyanî re îmtîza kir, hukûmeta Belçîka ji biyanîyan re bi tenê çend mafên piçûk ku ew dabû karkerên belçîkî jî, weka sîgorta, temîn...da. Ev hukûmet mafên mirovatî, weka şertên rûniştinê, mafê xebatê, xaniyê, saxiyê, hînbûnê, di mahallê de jînê... bi carek berdabû.

Pirr caran, mercên (şertên) xebatê û hêwîbûn (rutûbet) û piçûkbûna xanî dibin sedemên nexweşiyên rastî, ango ên ne psikolojîk.

Rast e ku karkerên biyanî mafên saxiyê û hînbûnê pirr giring dibînin. Lê, rast e jî ku ne saxî û ne di bîstanan de hînbûn li gora biyanîyan (û ne li gora piraniya gelê belçîkî jî) amade bûne.

Zorbûna entêgrasyonê gelek pirsan di nav malî bi xwe jî derdixîne :

- Pirsên nav jin û mêr :

Mêr, ji ruyê zorbûnên kuli Ewropa dixîne, pirr dêşe û dihesa ku prêsîtiya wî hundadibe. Loma, ne razîbûna xwe davêje ser jina xwe, ev jina ku, di welatê wî de jî, ji mêr kêmtir tê dîtî. Ji alîkî din jî, mêr dikeve bin tesîra cazîbiyeta cihên kêfê. Lê, maaşê wî yê piçûk nahêle ku ew bi awakî muntazam biçe van cihan. Loma, pirr caran, pere dibe sedema şerrên giran di nav jin û mêr de. Di van şerran de, mêr tereddut nake ku li jina xwe xe, yan jî jêre îhanet bike. Jin jî vê rewşê pirr dêşe, ji bo ku dê û bavê wê ne li Belçîka ne ku karibin wê biparêzin.

- Pirsên zarokan :

Bi awakî nazerî (têorî) em karin bê-

Û MÊKANÎZMÊN

(DÎ CIVAKEKÎ NUH DE CÎH GÎRTÎN)

Pervîn

jin ku zarokên cuhan ji dê û bavên xwe siviktir di civaka belçikî de cih digrin. Lê, ew pîrr caran, di nav her du çandan : çanda ku ji dê û bavên xwe stendine, û çanda ku li dibistanê û kuçê hîn bûne, têr kişandin. Loma, tehlîkekî mezin ji bo wan heye : yan ewê ji koka qutbibin, yan jî ewê hundabibin, ji bo vê yekê, ew ji malê yan ji dibistanê direvin. Keçên cuhan ji xortan du caran bêtir dêşin, ji bo ku dê û bavên wan, ji tîrsa civaka ewrupî, bi wan re ji lawên xwe hişktirin û dixwazin li ser wan urf û adetên kevî tatbîk bikin.

Çareyên mumkun :

- Rêzanekeî resmî û rast ji bo cih kirina biyanîyan û temîna mafên bingehîyên mirovatî, ji aliyê hukûmeta Belçîka : ev maf, pêwîst e ku ji aliyê komelên belçikî û biyanî, bê rawestan, bîr xwestin.
- Aqahdariyekî dîr û dirêj li ser pirsên biyanîyan, ji bo merivên ku di wezîfên xwe de bi biyanîyan re kar dikin, weka mermûrên belediyan, mamosta, doktor..., û aqahdariya her du civakan : a belçikî û a biyanî, li ser hemû pirsên biyanîyan.
- Pêwîst e ku hemû xebatên ku li ser biyanîyan çêdibin firehtir û girêdayî hevdu bibin.



DIJMIN ÇI BI ME KIR


Ahmed

Van dijminan gelek zordestf li me kir
Û em hatin keribandin.
Em bi çîrok û qesîdan
Bi kevneperestan dan razandin.
Bi navê eşîr û axa
Bi ser gel de hêriş kişandin.
Mal dan bar kirin.
Gund wêran kirin, hatin şewitandin.
Qesr û olî û heta bi kaviîlên mayin
Ji alfyên wan hatin hêrivandin
Bi sergoma, mecburî îskana asîmîlasyonê
Armanca wan bû ku me bidine qelandin.
Bertîl û rişwet derxistin
Li insanî ji hev çêtir meyizandin
Ji onbaşîk û neferan re
Berx û beran dan gurandin.
Ser erd û bin erd talan kirin
Tev bi metropolê de revandin.
Derxistin qanûnên vêrgîyan
Û bi wan millet giş şelihandin
Ketin nav me bi heval tî
Kuştina bira bi bira ceribandin.
Di operasyon û arama de
Bi tona fişek ser gel de barandin.
Di cihê kuştina eskerekî pîsik
Dê, keç û zaro heyifandin.
Gelek serî şikandin
Hestiyên laşan derizandin
Heçî kesên hatin girtin
Simbêl û dinanên wan hilkişandin.
Wan gelek kuştin
Kezebên dayikan şewitandin.
Li ber têlên hidudan û bi mayinan
Pirr çeng û ling bi azmên de firandin.
Gelek xort û keçên ciwan
Bi daran ve dalaqandin.
Kesê mafê gel parast
Heta bi şoresgêrên wan jê enitandin.
Dijî van de ger ji mere jî nebê rawestandin
Û em jî bi hev re kêlya wan bidne qedandin.

HÊVÎ

Derwêş M. Ferho

Bi bivir
bêr
sêgulî û melheb
Ji kolanan wê rabin
rabin pîyan
Hember talanê.
Ji alîkî lîle lîl
Ji yê din qêrîn
bilînd dibe.
Nevîyên Elî Şêr
Çekdarên Dêrsîm
Dê rabin ser xwe
kozîkên neyeran xerab bikin.



SAMAN
07/10/1983

XEBATA ME

- 6.4.: Şeva Yekîtiya Giştîya Xwendekarên Tunîsî li zanîngeha U.L.B., li Bruxelles. Em bi raxistina pirtûk, broşur, sîlik û kasetan beşdar bûn.
- 9.4.: Civîna CLIFI (Komîta Pêwendîya Jinên Biyanî) ku em endamê wê ne, ji bo amadekirina dosyekî li ser pirsên jinên biyanî li Belçîka.
- 12.4.: Civînek li Beledîya St-Josse, li Bruxelles, li ser pirsên biyanîyên vê beledîyê.
- 19.4.: Civînek bi komelên tirk re: BTIB, DIB-AF, GERÇEK, ji bo amadekirina rêveçûna I'ekê Gulanê, bi partiya Komunîsta Belçîkî re.
- 20.4.: Di munasebeta axaftina Parlamana û Konseya Ewropa li ser Tirkiyê, me telegrafan şand ji Léon Tindemans (Wezîrê Karên Derve yê Belçîka), Sefîrê Tirkiye li Bruxelles û Parlamana Ewropa re.
- 21,22.4 : Kongra Yekîtiya Dêmokratîka Bretonan li bajarê Lorient, li mintîqa Bretagne, li Fransa (Breton hindikayîyekî ye ku li Fransa mafên xwe yê çandî dixwaze). Endamêkî me bi slavnamekî ji Têkoşer beşdar bû wê kongrê û piştgirtîya wan kir (rûpel...binêre).
- 26.4.: Civîna bi Komîta Belçîkî ji bo Parastina Mafên Mirovatî li Tirkiyê û komelên tirk û kurd re, ji bo ku em bi hev re çend xebat li ser parastina mafên gelên tirk û kurd bikin, di munasebeta biryarstendinê Parlamana û Konseya Ewropa li ser Tirkiyê.
- I.5.: Rêveçûna Yekê Gulanê bi Patîya Komunîsta Belçîkî re, tevî komelên ku navên wan li jor derbasbûne. Me bi hev re di kortêjê û di kortêja Partîya Sosyalîsta Belçîkî de belavokek li ser rewşa Tirkiye û Kurdistanê belavkir.
- I.5.: Piştî rêveçûnê, em beşdar bûn şeva Koma Dêmokratîka Marokî. Berpirsiyarê şevê rewşa Kurdistanê, bi erebî û fransîzî, da naskirin. Paşê, me bi slavnamekî piştgirtîya gelê marokî kir û me govend û stranên kurdî pêşkeşkir. Ji aliyê din jî me

pirtûk, broşur, sîlik û kasetan raxist.

- 2.5.: Civîna çapê ya Komîta Belçîkî ji bo Parastina Mafên Mirovatî li Tirkiyê, di munasebeta vege-ra delagasyona Konseya Ewropa ji Tirkiyê. Di vê civînê de, Parlamantêrê Sosyalîstê Belçîkî Claude de Jardin û Sênatorê Partîya Walonî ya Gel, J.E. Humblet, û avkatê kurd, Huseyn Yildirim peyivîn. (rûpel...binêre).
- 7.5.: Di munasebeta vekirina pîrsa Tirkiyê, me telegrafekî ji Konseya Ewropa re şand.

-Her 15 rojan de carek:

Civîna Koordînasyonê ji bo parastina mafên biyanîyan li Belçîka (hejmar 23 binêre).

JÎ ALIYÊ ÇAPE :

- Nivîsarek bi fransîzî di kovara "Partisans de la Paix" de, hejmar 8I, Adar-Nîsan 1984, rûpel 19-29, li ser rewş, çandî dîroka Kurdistanê.
- Nivîsarek bi flamanî di kovara "Vlaanderen in de Wereld" de, hejmar Nîsan 1984, rûpel 14-16, li ser şexsiyeta kurdî.



TÊKOŞER'DEN HABERLER

6 Nisan 1984 :

Tunuslu Öğrenciler Birliği tarafından Bruxelles ULB üniversitesinde düzenlenen geceye kitap standımızla katıldık. Têkoşer adına dayanışma mesajımızı sunduk.

9 Nisan 1984 :

Yabancı Kadınlar Birliği (CLİFİ) tarafından Belçika'daki yabancı kadınların sorunları üzerine hazırlanacak dosyayı görüşmek için hazırlanan toplantıya katıldık. Têkoşer de adı geçen birliğin üyesidir.

12 Nisan 1984 :

Bruxelles'in Saint-Josse belediyesi tarafından, belediye başkanı, belediye yabancılar konseyi üyeleri ile değişik yabancı örgütlerin katıldığı toplantıda; Têkoşer'in kısa geçmişi amacı ve çalışmaları hakkında bilgilendirme yaptık. Yabancı Göçmen İşçilerin ve siyasi mültecilerin problemlerini, sorunlarını anlattık.

19 Nisan 1984 :

Belçika Komünist partisinin düzenleyeceği 1 Mayıs yürüyüşüne; Türkiye'li örgütlerden BTİB, DİB-FAK, GERÇEK'le birlikte katılmak için bir hazırlık toplantısı yaptık.

20 Nisan 1984 :

Avrupa Konseyi'nin Türkiye ile ilişkilerin yoğunlukla tartışılacağı toplantı münasebetiyle; Türkiye'de insan hakları ve özellikle demokrasi anlayışı, Kürt ulusunun üzerindeki ulusal baskıya dikkati çekmek için, Belçika Dışişleri Bakanı Léo TINDEMANS, Türkiye Belçika Konsolosluğu ve Avrupa parlamento Başkanına birer telgraf çektik.

22-23 Nisan 1984 :

Fransa'da bir azınlık olan, kültürel haklarını savunan BRETON Demokratik Birliği Komitesi tarafından LORİFNT te düzenlenen yıllık kongrelerine bir üyemiz katılarak Têkoşer adına dayanışma mesajımızı sundu. İlgili açıklama için sayfa bakınız.

26 Nisan 1984 :

Belçikalılardan oluşan " Türkiye de insan haklarını savunma komitesi " tarafından, Türkiyeli ve Kürdistanlı çeşitli örgütlerle, Türkiyede Türk ve Kürt halklarının haklarını savunmak, Avrupa Konseyi'nin Türkiye ile ilgili alacağı kararlar ve gelişmeleri açıklayıp ortak bazı eylemler saptamak için toplandık.

Adı geçen toplantıya, Avrupa parlamentosu'nun 26 Nisan 1984 tarihli toplantısına katılan Kürt avukat Hüseyin YILDIRIM da katılarak bilgiler verdi. Bir avukat olarak hukuksal açıdan Türkiye'de insan haklarının nasıl çiğnendiğini ve gerek mahkeme salonlarında gerekse tutuklanıp işkence gördüğü sırada karşıladığı uygulamalar hakkında da bilgiler verdi.

1 Mayıs 1984 :

"Türkiyeli ve Kürdistanlı Demokratik Örgütler " flaması arkasında BTİB, DİB-FAK, GERÇEK, TÊKOŞER olarak Belçika Komünist Partisiyle beraber, Uluslararası İşçi Sınıfı'nın Birlik ve Dayanışma günü olan 1 MAYIS' a katıldık.

Türkiye ve Türkiye Kürdistanı ile ilgili Fransızca-Flamanca, Türkçe basılan binlerce bir bildiriye geniş kapsamlı olarak dağıttık. Fransızca, Flamanca, Türkçe, Kürtçe ortak belgeleri taşıdık ve haykırdık. 1 Mayıs'ın tarihçesi üzerine hazırlanan yazı için sayfa bakınız.

1 Mayıs 1984 :

1 Mayıs yürüyüşünden sonra Marokanlı " Faslı " Demokratik Örgütler Birliği tarafından düzenlenen geceye kitap standımız, müzik ve folklor ekibimiz ile katılarak dayanışmamızı sunduk. Fas'lı bir sorumlu gecede Fransızca-Arapça kısa bir açıklama yaptık.

2 Mayıs 1984 :

Türkiyede İnsan Haklarını Savunma Komitesi (Belçikalılardan oluşuyor) tarafından Brüksel Basın Merkezi İPC de yapılan Basın Konferansına katıldık. Avrupa Konseyi'nin Türkiye ve Türkiye Kürdistanı'ndaki Askeri ceza evlerinde incelemelerde bulunmak için

berê, ew ji hemû endamên Konseya Ewropa bêtir dijî cunta faşist û hevalê gelê kurd bû. Baş ku parlamantêrê Partiya Gel a Walonî, Sênatêr J. E. Humblet, û avkatê kurd, Huseyn Yildirim, di vê civînê de hebûn ji bo ku rewşa rast li Tirkîyê û Kurdistanê Tirkîyê bidin nas kirin.

DUMAHIYA RÜPEL II

- Ez ne dînim û ne harim. Ez mî-rekî bêçeleng, mêrxapînim. Ez qet girgirek û axa nahesbînim, ko ez ekfîya xwe yî soranî derbînim, bi rihê yekî weke te ye. (Çîroka Muso).
- Mistafê ket nav sêsad suwarê Mihemedê Kulavanî. Dibê yek firî yek fitilî. Tiştêk anî serê wana ko nehatîye serê heftê û du miletî. Ên ko kuşt, ên ko qorim kir, ên ko berê xwe dan çol û çîya. Dibêjin heta îroj, hin ji wana hêj rêya mala xwe nedîtin e. (Narencî).
- Qet mitala neke, got feqge. Min bîst kîlo ji vê qelîya şor xwaribî. Li serê kehnîkê, ji peşkik av bişawitim. Ji bonî xatirê te ser vê kehnîyê narawestim. Bawer bike ko sola min ji lingê min bikevî, şefqa min ji lezê, di çikulekî darekîde bimînî, ez lê navegerim. (ji çîroka Seyrê).

Ev sedem şanî me didî ko çîrokên me ji aliyê zimanê bêjeyî gelek hêja ne. Hevokên çîrokan kurt nayên hesêbê. Di nav çîrokan de gelek hevokên bihevve girêdayî û hevokên hevdudanî (bagli, birleşik cumleler) hene. Lê zimanê çîrokên me î ji xemlê dûr, hêsa û paqij, bûyerên giring wan hevokan bi me bihêsayî didin xwendin.

Berşir, Berwar, Berxwevan, Berak, Berû, Bexto, Bextyar, Bêbeş, Bêdad, Bêdexş, Bêkar, Bêmal, Bênav, Bêstûn, Bêtoş, Bêxêr, Bidax, Bijir, Bilind, Binar, Bine, Binwar, Binyat, Birco, Birûsi, Biryar, Bizav, Bibo, Birtij, Biyang, Boşnax, Bozo, Beyar, Bêcan, Bêdar, Bêjen, Bêkes, Bêmar, Bênhati, Bêşeng, Bêxew, Bêyar, Bijar, Bilêse, Blûrvan, Binçin, Binedar, Bingul, Biradost, Biro, Birûsk, Birzo, Bizot, Bina, Birxoş, Borkan, Botan, Buhriz.

SAYFA 22'IN DEVAMI

gönderdiği delegasyonun izlenimlerini Belçika Sosyalist Partisi millet vekili Caude DEJARDIN anlattı. Valon Halk Partisi Senatörü J.E. HUMBLET ve Kürt Avukat Hüseyin YILDIRIM da söz alarak baskıları ve verilen bilgilerin sahte olduğunu, heyetin tesir altında kaldığını belirttiler. Hüseyin YILDIRIMIN konuşmalarını bir üyemiz Fransızcaya çevirdi. İlgili açıklama için sayfa bakınız.

7 Mayıs 1984 :

Avrupa Konseyinde Türkiyenin tartışılacağı toplantı münasebetiyle Avrupa Konseyi Başkanına bir telgraf çekerek, Türkiyede Kürt ulusunu üzerinde ki ulusal ve insanlık adına utanç verici baskılara dikkati çekmeye çalıştık.

15 günde bir Yabancıların haklarını savunma komitesi (220 örgüt üyedir) tarafından düzenlenen toplantılara katıldık. İlgili açıklama için TÊkoşer dergisinin 23. sayısına bakın.

Y A Y I N A L A N I N D A :

Kürdistan'ın kültürü, tarihi ve bugün kü durumu üzerine Fransızca 2 sayfalık bir yazıyı " Artisans de la Paix" (Barış Partizanları Dergisi) nin Mart Nisan 1984 tarih ve 81 sayısında yayınlattık.

Kürt Halkının şahsiyeti, kimliği üzerine Flamanca 2 sayfalık bir yazıyı

"Vlaanderen in de Wereld " dergisinin Nisan 1984 tarihli sayısında yayınlattık.

1 MAYISLAR

Yalçın

Bir Mayıs, uluslararası işçi sınıfının birlik, mücadele ve dayanışma günüdür. İşçi sınıfının sömürüye, baskıya karşı başlattığı mücadelede özel bir yer olan bir gündür.

Bir Mayıs, bütün dünya işçi sınıfının sosyalist bir dünya için, bağımsızlık, demokrasi, sosyalizm uğrunda güçlerini birleştirdiği gündür.

İşçi sınıfının uluslararası sermayeye ve tekellerin sahibi burjuvazi sınıfına karşı 8 saatlik iş gününü hak olarak kazandığı gündür.

Eskiden kapitalizm işçi sınıfını (Erkek, kadın, çocuk dahil) 14,16,18 saat çalıştırıp, sosyal haklardan yoksun sömürüyordu. İşçiler sürekli olarak işgücünün kısaltılması için mücadele ettiler. Aralarındaki rekabeti ortadan kaldırarak sendikalarda örgütlendikten sonra, iş gücünü 10,12 saat'e indirdiler. Avrupanın kapitalistleşme süreci içinde olan ülkelerinde işçi sınıfının mücadelesi giderek daha da gelişti.

1848 yılında bilimsel sosyalizmin kurucularınca yayınlanan manifesto, işçi sınıfının ekonomik, siyasi ve ideolojik mücadelesinin bütünlüğünü vurgulayarak, şöyle sona eriyordu.

"proleterlerin zincirlerinden başka kaybedecek bir şeyleri yoktur. Kazanacakları koskoca bir dünya vardır. Bütün ülkelerin işçileri birleşiniz."

1848 Devrimlerinde bilenen işçiler, 1871 Paris Komünü'nde daha bir eğitildiler. İşçi sınıfının örgütlenme, bilinç düzeyi giderek yükseldi. İşçi sınıfının mücadelesi zamanla ulusal boyutları aştı. Bu gelişim içinde işçi sınıfının uluslararası birlik ve dayanışması 1846 yılında uluslararası işçi derneğinin (1. enternasyonal) kurulmasıyla somutlaştı. 1. enternasyonelin mücadele hedeflerinin aşında 8 saatlik işgücünün kazanılması geliyordu.

1886 yılında ABD'nin Chicago kentinde işçi sınıfının "8 saatlik işgücü" ve bazı ekonomik, demokratik hakları için yüzbinlerce işçi genel greve gitti. Ülkeleri sarsan bu olay üzerine burjuvazi 3 Mayıs günü kiralık katilleriyle kışkırtmalara başladılar. 6 işçiyi öldürdüler. Bu katliamı protesto etmek için 4 Mayıs 1886'da işçiler çeşitli gösteriler yaptılar. Burjuvazinin ajanları tarafından atılan bir bombanın patlaması üzerine birkaç polis ve 4 işçi daha öldü. Çok sayıda işçi yaralandı.

Olayların sorumlusu olarak 8 işçi önderi tutuklandı. Bir işçi önderini hücrelerinde öldürdüler, 3'nü çeşitli hapis cezalarına mahkûm ettiler. 4 işçi önderini de 11 Kasım 1887'de astılar.

1 MAYIS 1886'yı işçi sınıfı unutmadı. 3 yıl sonra 14 Temmuz 1889'da Paris'te toplanan 2. ci Enternasyonal'in 1. kongresinde 1 Mayıs "işçi sınıfının uluslararası birlik, mücadele ve dayanışma günü" olarak kabul edildi.

1909'lardan başlayarak Türkiye işçi sınıfı 1 Mayıs'ları kutlamaya başladı.

1921'de 1 Mayıs gösterileri daha bilinçli bir düzeye ulaşırken, 1925'ten sonra kitlesel olarak 1 Mayıs'ların kutlanması yasaklandı. İrkçi, şöven, kemalist düşünce ideolojisi, işçi sınıfının bayramını anlamından saptırarak "bahar bayramı" olarak ilan etti. Ne ki Türkiye ve Türkiye Kürdistanı işçilerinin beraber aldığı DİSK sendikası öncülüğünde bu yasağın zinciri 1976'da kırıldı. Sömürgeci burjuvaziye zaman zaman korkulu anlar yaşatıldı. (15-16 Haziran direnişleri) egegen sınıf sömürgeci burjuvazi 1 Mayıs 1976'da Taksim'de Disk'in öncülüğünde kutlanan 1 Mayıs'a ajanlarıyla saldırdı. Gerici faşist güçler tarafından çıkarılan olaylarda 36 işçi katledildi. Bu provokasyon'a rağmen 1978 yılında yine Disk'in öncülüğünde 54 demokratik kitle örgütü üyeleri, bağımsız sendikaların üyeleri, Türk-İş'e bağlı sendikaların üyeleri, yüzbinlerce emekçi birlikte 1 Mayıs gelineğini yaşattı.

1 Mayıs 1979'da ise değişik eylem biçimleri şeklinde Türkiye ve Türkiye Kürdistanı'nda kutlandı. 1978 yılı sonunda faşist odakların kahramanmaraş'ta giriş-tikleri katliamı nedeniyle 8'i Türkiye Kürdistanı'nda olmak üzere toplam 13 ilde sıkıyönetim ilan edildi. 1 Mayıs kutlamaları için Disk'in bütün yasal başvuruları kâr etmediği gibi Disk genel merkezi basıldı. Genel Başkan Abdullah Baş türk ve yürütme kurulu üyeleri gözaltına alındı. 1 Mayıs 1979'da sömürgeci egegen burjuvazi sokağa çıkma yasağı koydu. İstanbul ve diğer büyük yerleşim merkezlerini zindana çevirdi. Baskılarını yoğunlaştırdı. Her türlü yasağa rağmen Türkiye'nin değişik merkez ve yörelerinde çeşitli eylem biçimlerinde 1 Mayıslar yaşatıldı. İlk defa Türkiye Kürdistanı'nda (kuzey kürdistan'da) Disk'e bağlı çeşitli sendika ve Kürdistanlı demokratik kitle örgütlerinin katıldığı 1 Mayıs Bitlis'te yığinsal olarak kutlandı.

12 Eylül 1980'de iktidara zorla el koyan faşist askeri cuntanın iş başına gelmesinden bu yana, Türkiye ve Türkiye Kürdistanı'nda değil 1 Mayıs'lar, işçi sınıfının her türlü hakları çignendi, ve hala çignenmektedir. Kürdistan'da ulusal kırım hat safhaya ulaşmıştır.

Kaynak: Tek Cephe İno-Türk